# Malbatên bihêz xwedîyê keçên bihêz in!



Em bi keçên xwe serbilind in!

*kurdisch*

## Dêûbavên Xoşewist,

Bê guman hûn bi zarokên xwe, bi keç û kurên xwe serbilind in. Hûn bi tiştên ku ew dikarin, dizanin û dixwazin bi dest bixin, serbilind in. Hûn wekî dêûbav bi tenê tiştên ku ji bo wan baş in, dixwazin. Tiştên wekî ewlehî, malbat, heval, tendirustî û bextewarî.

Em dixwazin bi vê broşûrê îmkan û derfetan nîşanî we bidin, da ku ji bo rêya avakirina jîyaneke xweser hûn ê çawa bikaribin piştgirîya keçên xwe bikin.

Tîma we ya
TERRE DES FEMMES



» Ez wekî dayikek xwedîyê du zarokan, dizanim ku keç bihêz in û dikarin jîyaneke serbixwe bi rê ve bibin.

Zewacek zû dikare bandoreke mezin a neyinî (negatîf) li ser têkilîyên zarok û dêûbavan bike.

Divê em êdî daxwaz û xeyalên zarokên xwe guhdarî bikin û ji bo ew bikaribin van daxwaz û xeyalan xwe bi dest bixin, piştgirîya wan bikin û wan teşwîq bikin.

Mafê her keçikê heye ew bixwe biryar bide da ku dê bi kê re bizewice! Malbatên bihêz xwedîyê keçên bihêz û xweser in! «



Nazan Eckes

# » Hemî  mirov azad in û bi rûmet û mafên xwe wekhev in «

Benda 1em a  Danezana Gerdûnî ya Mafên Mirovan

§

Li Almanyayê mafê herkesî heye ku di derheqê jîyana xwe de bi awayekî azad biryar bide. Mêr û jin li gorî qanûnan azad in. Jin dikarin biryar bidin ku dê kijan kar û pîşeyê hilbijêrin.







# Mafê tu kesî tune bi zorê jineke bizewicîne. Malbat bi xwe jî nikare vê yekê bike.

Ev xalên jêrîn Li Almanyayê bi qanûnî xedexe ne:

## Zûtirîn

- Zewaca fermî ya berî 18 salî
- Merasîma zewacê ya olî û kevneşopî ya berî 18 salî (Heke keçik zewacê qebûl bike jî)

↓

Li Almanyayê zewaceke ji 18 salî piçûktir dikare heta 5000 ewroyî bi cezayê diravî bê cezakirin.

## Zewaca bi zorê


- Zewaca li derveyî vîn û daxwaza keç an jî jinekê ya bi gefxwarin û bi pêkanîna şîdetê
- Ji bo zewacê revandina derveyî welat


↓

Ji bo zewaca bi zorê meriv dikare li Almanyayê heta 5 salan bi cezayê hefsê bê cezakirin Ger zewaca bi zorê li derveyî welat pêk were jî heman ceza derbasdar e (§237 StGB).

**Hemî ol destûr didin jin û mêran da ku bi serê xwe biryar bidin bi kî/ê re bixwazin bizewicin.**

Ji ber vê yekê ji bo zewaca zû an jî zewaca bi zorê tu sedemên olî tune.






# Keç û jin pirîcar di jîyana xwe ya zewacê de bi şîdetê re rû bi rû dimînin

Ger jinek di temenek pir zû de ducanî be, ev rewş dikare ji bo wê û zarokê wê xeternak be.

Ger keç û jinên ciwan zû an jî bi zorê bên zewicandin, êdî destûr nayê dayin biçin dibistanê jî.

Kêça we ji bo perwerdeyek baş a pîşeyî, ji alîyê fînansê ve di ewlehîyê de ye. Li Almanyayê ji bo jinan derfet heye ku hem bibin xwedîyê malbatek û hem jî bixebitin.

» Zewaca zû û bi zorê ji bo zarokan barek mezin e û dikare li ser nivşên nû trawmayek demdirêj pêk bîne! «

Sajjad – yê ku bi zewaca bi zorê re rû bi rû maye bi xwe dibêje

Keça we ji we hez dike, ligel we rêzdar e û qedrê we dizane. Hin keç dema bi darê zorê tên zewicandin, malbatên xwe terk dikin. Lê ya rastîn keça we pir dixwaze wekî parçeyek ji malbatê bimîne.

» Min ji her tiştî zêdetir ji malbata xwe, ji dêûbavê xwe û ji xwişk û birayên xwe hez kir. Dema min dizanibû ez ê mecbûr bimli derveyî daxwaza xwe bizewicm, êdî ez nema dikribûm li malê bisekinim. Ez niha ji malbata xwe cihê me û her roj bêrîya wan dikim. Ji bo min ya herî xirabtir ev e: Ew ê zarokên min nas nekin, ew ê tu car nizanibin çi bi serê min de hatîye «

Dengê qurbanîyek

**Hûn dixwazin ku keça we baş be. Malbatên bihêz û bixwebawer xwedîyê keçên bihêz û xweser in! Hûn dikarin hinek tiştan biguherînin!**

**Ji ber vê yekê: Bi keça xwe re bipeyivin. Hewl bidin ku hûn keça xwe fêm bikin. Bipirsin, keça we çi dixwaze.**



## Hûn ne tenê ne!

Hewl bidin da ku hûn bikaribin
ji malbatê alîkarî bigirin
an jî serî li sazîyeke
şêwirmendîyê bixin.

**Hûn dikarin ji vir alîkarî û piştgirîyê werbigirin:**

**Li her derê welat alîkarîya telefonê ji bo jinan**

**08000 116 016**

(rojane 24 saet gihîştbar e,
bê pere û li gor daxwazê bênav)

**BIG – Şêwirmendî ji bo jinan li ser şîdeta navmalî**

**030 611 03 00**

(saet 8:00 heta 23:00,
bê pere û li gor daxwazê bênav)

**Li her derê welat alîkarîya telefonê ji bo mêran**

**0800 123 99 00**

(Duşem-Înî
-bê pere û li gor daxwazê bênav)

Li her derê welat cihên şêwirmendîyê li ser malpera

**www.zwangsheirat.de**



li ser zewaca zû û bi
zorê broşûra agahdarîyê

Gefördert durch die
Aktion Mensch

TERRE DES FEMMES
Menschenrechte für die Frau e.V.

www.frauenrechte.de

07/2022

Illustrationen: Miriam Barton / miratrick.de, Gestaltung: Jessica Sturm-Stammberger